

**Ji bo dêûbavên, zarokên
wan diçin kreşên Berlinê**

29.03.2021

**Agahiyên ji bo dêûbavan ên li ser xebata lînêrîna zarokan a piştî
29ê Adara 2021an**

Dêûbavên hêja, stî û mîrzayên rêzdar,

her çiças gelek tedbîrên cûrbicûr ên ji bo pêkanîna xizmeteke lînêrîna zarokan a domdar û ewle hebin jî, hejmara pêkhatinên enfeksiyonê her wisa li navendên lînêrîna zarokan ên Berlinê her bêhtir dibe, ku ji ber vê sedemê bi berdewamî her bêhtir hêlîn bi giştî yan jî tenê beşek jê tên giritin. Di heman demê de her wisa li Berlinê jî hejmara zarokên bi vê nexweşiyê dikevin bêhtir dibe. Ji ber vê yekê em ji we rica dikin, ku bi berdewamî teqez bi qasî ku pêwîst e, hûn ewqas sûdê ji xizmeta lînêrînê bigirin û di derbarê vê mijarê de bi rêkûpêk li gel hêlîna xwe biaxivin.

Wekî din ev rêbaz pêk tên:

- **Xebata asayî ya berbisînorkirî berdewam e.** Divê lînêrîna zarokan bi qasî, ku pêkan e, di komên neguherbar de pêk were. Gava ev yek ji ber sedemên organîzekirinê ango yên xebatkaran ne pêkan be, hingê çarçoweya xizmeta lînêrînê dikare were berbisînorkirin.
- **Zarokên nîşaneyên sermagirtinê bi wan re hebin, nikarin sûdê ji lînêrînê bigirin.** Ev yek her wisa ji bo zarokên dikuxin, zekemî ketine yan jî agirê wan heye jî derbas dibe. Alternatîv hûn dikarin encama testa-zû/testa-xweser nîşan bidin. Divê pêkanîn û nûbûna testê, bi riya nivîseke xweser an jî ji aliyê navenda testê ve werin piştrastkirin. Mirov dikare li tevahiya navendên testan ên Berlinê testa zû bide kirin. Ji kerema xwe re hûn di destpêkê de bi serê xwe binirxînin, ka zarokê/a we dê bihêle, ku kesekî nenas wî/wê test bike. Gava ji aliyê organîzasyonê ve pêkan be, dêûbav dikarin testa xweser bi serê xwe bi kar bînin. Texmînî ji nivê meha Nîsanê û wir ve **testên xweser ên ji bo zarokan** dê radestî hêlînên zarokan werin kirin.
- **Destûra xebatkarên perwerdehiyê êdî heye, ku maskeyên tîbbî yên ji bo dev û rûyî her wisa di dema tîkiliya rasterast a bi zarokan re jî bi kar bînin.** Di dema tîkiliya rasterast a di navbera mezinan de mecbûrî ye, ku ew maskeyên tîbbî yên ji bo dev û rûyî bi kar bînin. Tenê gava belgeyeke ji aliyê doktorî ve were pêşkêşkirin, hingê ji bo bikarnenanîna maskeyên tîbbî yên ji bo dev û rûyî îstîsna dikare were kirin.

Her wisa bi riya pêşkêşkirina derziyan a ji bo xebatkarên hêlînên zarokan û xizmeta berdewamî ya radestkirina testên zû xizmeteke domdar a hêlînên zarokan pêkan bûye. Ji ber ku niha zarokên biçûk jî her bêhtir bi nexweşiyê dikevin, loma kêmkirina pêwendiyên û şopandina pêwendiyên pêkhatî gelek girîng in. Ji ber vê yekê em bi domdarî dixwazin, ku hûn her wisa derdora xwe ya şexsî jî bifikirin.

Ji bo pirsên we, xeta telefona acîl a dêûbavan a Rêveberiya Senatoya Perwerdehî, Ciwan û Malbatan hêjî bi berdewamî di xizmeta we de ye. Hûn dikarin bi vê hejmarê 030 - 90227 6600 di tevahiya rojên xebatê de ji 9an hete 15an xwe bigihîninê (ji bilî 01.04.2021).

Li gel silavên germ

Peywirdar

Holger Schulze

Rêveberê Daîreya

Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk